

# Şîrê Mela Ehmedê Xasî yê Kurdkî (Kurmanckî, Zazakî) û Tirkî

## Molla Ahmed-i Xasi's Kurdish (Kurmancji, Zazaki) and Turkish Poems

**Mehmet YERGİN**

Mehmet Yergin | 0009-0001-8625-8525 | yergin21@hotmail.com

Master's Graduate at Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Türkiye,  
Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Türkiye

**Citation:**

Yergin, M. (2024). Şîrê Mela Ehmedê Xasî yê Kurdkî (Kurmanckî, Zazakî) û Tirkî. *Nubihar Akademi* 22, 81-102. DOI: 10.55253/2024.nubihar.1566415

Article Type	Research Article
Submission Date	13.10.2024
Acceptance Date	10.12.2024
Publication Date	31.12.2024
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – iThenticate
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare.
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the <b>CC BY-NC 4.0</b> .

**Kilmnus**

Heta nika Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) û eseranê ey ser o hetê zaf kesan ra zaf xebatê erjayedî virazîyayî û çimneyanê ciya ciyan de weşanîyayê. Labelê seba ke xoresnayışê nê çimneyan zaf zehmetin o û zaf wext gîno, no zî qandê cigêrayoxan û înañê ke wazenê xo biresnê şîrîranê Mela Ehmedê Xasî yê kurdkî (kurmanckî, zazakî) û tirkîyan rê yew persigirêk ano meydan. Ma na xebate, bi hêvîya çareserkerdişê na persigireke de yew havila ma bireso ci, ma viraşte. Meqsedê ma mewlidê Mela Ehmedê Xasi Mewlidu'n-Nebiyyî'l-Qureysiyyî ke bi kurdkiya zazakî û şeklê mesnewî de nusîyayo ra teber, şîrê Mela Ehmedê Xasî yê ke bi kurdkî (kurmançî, zazakî) û tirkî nusîyayê, ma yew ca de pêserkê û seba kesanê ke biwazê xo

biresnê ci û tira feyde bigîrî rê bibê hetkar. Seba nê, ma orijinalê nê şîranê Mela Ehmedê Xasî yê ke bi herfanê erebkî nusîyayê komputure de nuştê, ta ke bi asanî biwanîyê û ma duştê her misra de zî şeklê ïnan ê transkîrbeyî dayê. Ma transkîrbeyê ke hetê kesanê cîya cîyayan ra virazîyayê pêvero nayê, fergê ke bêntareyê ïnan de estbî û raştkerdişê ke hetê ma ra virazîyayê ma binenotan de dayê. Bi no hewa ma Şîrê Mela Ehmedê Xasî yê kurdkî (kurmanckî, zazakî) û tirkîyi resnayê metnêk saxlem.

### Kilîtçekuyî

Edebîyat, şîre, Kurdkî (Kurmanckî, Zazakî), Tirkî, Xasî.

### Abstract

Until today, many valuable studies on Molla Ahmed-i Xasî (1867-1951) and his works have been carried out by many people and published in different sources. However, since it is quite laborious and time-consuming to access these sources, it poses a problem for researchers and those who want to access Molla Ahmed-i Xasî's Kurdish (Kurmanji, Zazaki) and Turkish poems. We made this study with the hope that it will contribute to the solution of this problem. Our aim is to collect Molla Ahmed-i Xasî's poems in Kurdish (Kurmanji, Zazaki) and Turkish, except for his mawlid Mewlidu'n-Nabiyyi'l-Qurayshiyî, which he wrote in the masnavi genre in the Zazaki dialect of Kurdish, in one place and to contribute to the easy access and utilization of those who want to benefit. For this purpose, we have written these poems of Molla Ahmad-i Xasî in Arabic letters on the computer for easy reading, remaining faithful to the original, and we have given the transcribed form opposite each verse. We also compared the transcripts made by different people and gave the differences and the corrections made by us in the footnotes. Thus, we have provided a more solid text of Molla Ahmad-i Xasî's Kurdish (Kurmanji, Zazaki) and Turkish poems.

### Keywords

Literature, poetry, Kurdish (Kurmanji, Zazaki), Turkish, Xasî.

### Destpêk

Mela Ehmedê Xasî, (1867-1951) roşnvîrê dewrê Osmanîyan ê peyên û dewro verên ê Cumhûrîyetî ra yew o. Senî ke îlmê İslâmî de alimêko pîl o, edebiyat de zî edîbêko serkewte yo. Hem îlmê İslâmî de û hem zî warê edebiyatî de eserê erjayeyî nuştê. Eserê xo erebkî, fariskî, tirkî û kurdkî (kurmanckî, zazakî) nuştê. La ci heyf ke zaf eserê ey vindî bîyê û nêresayê ma. M. Ş. Korkusuz<sup>1</sup> (2004) Ê ke resayê ma zî çimeyanê cîya cîyayan de nusîyayê. Heta ewro derheqê Melayê Xasî û eseranê ey de zaf xebatê erjayeyî virazîyayê û çimeyanê cîya cîyayan de weşanîyayê. Labelê heta ewro çewî şîrê ey yew ca de pêser nêkerdê û nênuştê. Wexto ke merdim biwazo xo biresno heme şîranê kurdkî (kurmanckî, zazakî) û tirkîyan yê Melayê Xasî, ganî kê gelek çimayan ra biewniyo û ci bigêyro. No problem semedê cigêrayroxan gelek zehmet o û hetê teserûfê weqtî ra zî israf o.

1 Kitabê M. Şefik Korkusuzî “Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Valileri I-II”, hetê Weşanxaneyê Kentî ra 2004 de weşanîyayo. Kitab tirkî nusîyayo, 352 rîpel û di qisim o. Destpêkê kitabî de tekke û zavîyeyê Dîyarbekirî ra behs beno. Qismê yewinî de 44, qismê dîyiñ de zî 54 şeyx û melayê Dîyarbekirî daşinasîyayê. Behsê Melayê Xasî, qismê yewinê nê kitabî de, rîpelanê 62-69 de viyareno. Korkusuz, behsê cuye û eseranê Melayê Xasî keno û vano şîranê ey ra di şîrê ke ma vîcnayê ma do bidî, labelê tena yewe şîra Melayê Xasî ya ke bi erebkî nusîyaya daya. (Yergin, 2024, 105-107)

No semed ra bi na xebata xo, ma waşt ke nê zehmetîyî orte ra wedarê. Ma do na xebate, tena şîîranê Melayê Xasî yê kurdkî (kurmanckî, zazakî) û tirkîyan ser o bivirazê. Na çarçewa de ma şîîrê Melayê Xasî yê ke cîya cîya cimeyan de weşaniyayê û ma pêhesayê, ma pêser kerdê û meqaleya xo de nuştê. Şîîrê Melayê Xasî yê ke orijinalê ïnan bi alfabeşa kurdkî ya erebkî nusîyayê ra, eyê ke ma eşkayê peyda bikerê, seba ke metnê ïnanê erbkî ra zî hîna asan biwanîyê ma komputore de newe ra nuştê û duştê her misra de zî transkirîbeyê ïnan dayê. Transkirîbeyê şîîranê kurdkîya kurmanckîyan de ma transkrîbeyê Mihanî<sup>2</sup> (1994), M. Zana Karak (2021), M. Zana Karak (2022) û yê A. Yıldızî (2021); şîîranê zazakî, tirkî û mulemmaya Melayê Xasî de zî ma transkrîbeyê Malmîsanij (1995) û yê Roşan Lezgînî (2009), Roşan Lezgîn (2013) esas girewtê. Ma nê transkirîbeyî metnê orijinalê ïnanê ke ma xo dest fînabî dir pêvero nayê û kontrol kerdê û kêmâyî û xeletiyê ke ma dîyê ma goreyê zanayîşê xo raşt kerdê û binenotan de nawnayê. Ma transkirîbeyê Malmîsanij û Roşan Lezgînî zî pêvero nayê û ferqê ke bêntareyê nê transkirîbeyan de estbî û tay cayê ke goreyê qenaetê ma xelet transkrîbe bîbî, ma raşt kerdê û binenotan de nawnayê. Reyna tay kêmâyîyê ke ma tesbît kerdê, ma vajê sey qaffîye, peymeyê hece û arûzê şîîran, ma ê zî tesbît kerdê û nuştê. Ma nê transkirîbeyan de herfê transkirîb ê miyanneteweyî gurenayê. Tena herfa “ç” ke alfabeşa kurdkî ya latînkî de sey “x” nusîyena û herfa “ç” ke sey “q” nusîyena, ma nê her di herfi sey alfabeşa kurdkî ya latînkî gurenayê.

Mewlidî kirdkî (zazakî) yê Melayê Xasî ra teber, heta ewro ma di şîîranê ey ê zazakîyan ra hayîdar bîyê. La çi heyf ke nînan ra yew şîîra eya ke tena yew beyta, kewta ma dest. Ma orijinalê na şîîre zî komputore de nuşte û duştê aye de zî transkirîbeyê aye daye.

Tirkî de zî heta ewro yew şîîra Melayê Xasî kewta ma dest, ke na şîîre kitabê destxetî yê Zeynelabidîn Amedî<sup>3</sup> (1986) de viyarena û hetê çend kesan ra destxetê Zeynelabidîn Amedî ra transkirîbe bîya. Reyna mulemmaya ey de zî yew misra tirkî ya. Ma nê transkirîbeyî zî pêvero nayê û ferq û xeletiyê ke ma tesbît kerdê, ma binenotan de nawnîyayê.

2 Nameyê Kitabî, “Mela Ehmedê Xasî-Mewlûdê Nebî-Bî Ziwanê Kurdî (Zazakî)” yo. Seke nameyê kitabî ra zî fehm beno no kitab, mewlidî Melayê Xasî yo. Mihanîyî mewlidî Melayê Xasî herfanê erebkîyan ra tadayo herfanê latînkîyan û 1994 de hetê Weşanxaneyê Fîratî ra weşanîyayo. Kitab 54 rîpelî yo. Mewlidî ra dima peynîya kitabî de ca dîyayo yewe şîîra kurmanckî û yew qismê şîîra tirkî yê Melayê Xasî zî.

3 Mela Zeynelabidîn Amedî, eseranê Melayê Xasî yê ke fineno xo dest, ïnan îstînsax keno û sey kitabî 1986 de Dîyarbekir de çap keno. No kitab hîrê qisim o. Qisimo yewin 15 rîpel o û nê qismî de bi nameyê “Kitabu Buşra'l-İbâdi Fî 'Ilmjîl-Iftiqâdi” û “Menzûmetun Qed Ceme'e Fîha Esmâillahi'l-Husna” di eserê menzûmî estê. Qisimo dîyin 12 rîpel o. Nê qismî de bi nameyê “Reddiyyetun Lil-Xasî”, “Cewabun Sani'l-Be'dî Meqalati Isma'il-el-Is'irdî” û şîîra Melayê Xasî ya tirkî “Xezelun Lîl Xasî” hîrê eserî estê. Qisimo hîrêyin zî 29 rîpelî yo. Nê qismî de zî mewlidî Melayê Xasî esto. (Yergin, 2024, 218)

Mulemmaya Seydayê Xasî ke bi ziwananê erebkî, fariskî, tirkî û lehçeyanê kurdkîyan ra kurmanckî û zazakî nusîyaya, merdim eşkeno hem qismê erebkî hem qismê fariskî hem qismê tirkî û hem zî qismê kurdkî (kurmanckî, zazakî) de bihesebno. No semed ra ma na xebate de ca da mulemmaya Melayê Xasî zî. Na şîre zî kitabê Zeynelabidîn Amedî de bi herfanê erebkî nusîyaya û hetê zaf kesan ra ser o nuşteyî nusîyayê û transkirîbe bîya. Ma nê transkirîbeyî zî pêvero nayê, ferqê ke bêntareyê ïnan de estê û xeletiyê ke ma tesbit kerdê, binenotan de nawníyayê.

Bi na xebate, keso ke biwazo şîrânê Melayê Xasî yê kurdkî (kurmanckî, zazakî) û tirkîyan ra îstîfade bikero, eşkeno nê şîran yew ca de bivîno û tira îstîfade bikero. Ma hêvîdarê ke bi na xebate havîlêka ma do bireso edebîyatê kurdkî (kurmanckî, zazakî) û ê ke biwazê xo biresnê şîrânê Melayê Xasî yê Kurdkî (kurmanckî, zazakî) û tirkîyan.

## 1. Sîirê Melayê Xasî Yê Kurdkî (Kurmanckî, Zazakî)

Heta ewro panc şîrî Seydayê Xasî ke bi kurdkîya kurmanckî û yewe zî bi kurdkîya zazakî nusîyayê kewtê ma dest. Ma nê eseranê ey de zî vînenê ke kurdkîya kurmanckî de zî sey kurdkîya zazakî bi westavî û bi hewayêko serkewte sîrî nûstê.

## 1.1. Şîrê Eyê Kurmanckî

Seke ma cor de zî vat bi, heta ewro panc şîrê kurmanckî yê Seydayê Xasî kewtê ma dest û ma pê hesyayê. Nînan ra yewe Mihanîyî fekê Mela Ehmedê Se'dî ra neqil kerda û kitabê xo de nuşta (Mihanî, 1994, r. 44-45). Yewe şîira ey, Ayhan Yıldızî yew meqaleya xo de fekê Mela Muhammedê Hezanî ra neqil kerda (Yıldız, 2021, r. 92) û hîrê şîrê ey zî M. Zana Karakî tesbît kerdê û kovara Nûbihar de weşanîyayê (Karak, 2021a, r. 10-15); (Karak, 2021b, r. 82-83); (Karak, 2022, r. 94-95) Cêr de ma do bi dore nê şîiran bidê.

### **1.1.1. Hicwîyeaya Se'îdê Karazî Ser o**

Na şîira Meleyê Xasî, kitabê Mihanî de vîyarena û Mihanîyî na şîire 1992 de fekê Mela Ehmedê Se'dî ra neqil kerda û bi herfanê latînkî kitabê xo (Mela Ehmedê Xasî, Mewlûdê Nebî) de mewlidî ra dima nuşta. Mihanîyî, derheqê na şîire de bi kurmançî zanayîşek zî dayo, ma no zanayîs tada zazakî û cêr de da;

Seba ke Mela Ehmedê Xasîyî na şîre bi weznê arûz nuştibî, wezn û kêşa şîre de kêmâyî estbî, no semed ra, mi M. Emîn Bozaslanî ra raştkerdişê wezn û kêşa şîre waşte. Labelê ey hem wezn û kêşa şîre hem zî çend qitayê ke Mela Ehmedê Se'dîyî xo vîr a kerdibü û néameynî vîra ci, ey zî temam kerdê [Mihanî, 1994, r. 44-48].

Na şîre yewndes (11) çaraneyan ra ameya meydan. Çaraneya hîrêyine erebkî, yê bînî kurmanckî yê. Bi peymeyê arûz û yewndes heceyan û şeklê murebba de nusîuya.

Manaya çekuyî yê "murebba" çarane ya. Nê şîrî çar misrayan ra yenê meydan û bi peymeyê arûzî nusîyenê. Qaliba qaffiyeyê ïnan zafêr aaaa/bbba/ccca/ddda/.../ yo, labelê murebbayê ke bendê ïnano verên bê kafîyeyo yan zî bendê ke dima ra yenê qaffiyeyê ïnan tekrar nêbeno zî estê. Nê şîrî menzûmî zafer 4-8 çaraneyan ra yenê meydan labelê murebbayê ke hîna zaf çaraneyan ra yenê meydan zî estê.

Wexto ke Se'îdê Karazî<sup>4</sup> (1847-1897) dewanê zazayan de melatî kerda, ey û dewijanê zazayan yewbînan aciz kerdê. Coka tay şîîrê ey duştê ïnan ê, yanî şîîranê xo de zazayî xirab kerdê. Îhtîmalو ke Melayê Xasî na şîîre, ê şîîrê Se'îdê Karazî ser o nuşta. Şîîra xo de bi hawayêko mîzahî Se'îdê Karazî hicîw keno yanî pê tinazê xo keno (Yıldız, 2021, r. 90-91).

M. Zana Karakî zî na şîîre nuşteyêk xo de daya (Karak, 2021a, r. 10-15). Ma şeklê na şîîre ke kitabê Mihanî de vîyarena û şeklê nuşteyê Karakî pêvero na û ferqê ke ma bêntareyê ïnan de dîyê û tesbît kerdê ma binenotan de dayê.

Heta nika ma raşt nêameyê ke çewî peymeyê arûzî na şîîre dayo. Goreyê tesbîtê ma peymeyê arûzî yê na murebbaya Melayê Xasî, behrê hecez yê nesalim ra "Mefa"îlun mefa"îlun fe"îlun" o. Şemaya qafîyeyê na şîîre baba/ccca/ddda/eee... û qafîyeyê aye zî "ا" "at" o. Seba ke misrayê çarinî yê na şîîre tekrar nêbenê, murabbayêka munzewîc a.

Mefa"îlun/mefa"îlun/fe"îlun

. - - - / . - - - / . - -

- 1 Dirêj ke **Xasiya**, nezmek cedîd e<sup>5</sup>  
Di piştî çend selam û çend tehiyyat<sup>6</sup>  
Li ser Karaziyê ku nav Se'îd e  
Dixwîne ew jiber Încîl û Tewrat
- 2 Li textê xwe ku rûnê Qeyser e ew  
Li hespê xwe siwar be "Enter e ew  
Di seyra roj û şev Îskender e ew  
Bi wechê xwe li Cahiz bûye deh qat
- 3 Lehû wechun "ebûsûn qemterîra  
Lehû şeklun yumasîlhu"l-be"îra<sup>7</sup>  
Lehû xeddun yucanîbhu"s-se"îra  
Huwe"l-kâbûsu beyne"n-nasî bîzzat<sup>8</sup>

- 
- 4 Ayhan Yıldızî, nameyê Se'îdê Karazîyi sey Sa'îyê Karazî nuşto. La şîîr de panc misrayan de nameyê ci "Se'îd" vîyareno. Beno ke Sa'i, mexlesê Se'îdê Karazî bo.
  - 5 Mihanî û M. Zana Karakî çekuya "Xasiya", "Xasîya" nuşta. Seba ke peymeyê arûzî xerepîyeno ma "Xasiya" nuşt.
  - 6 M. Zana Karakî çekuya "tehiyyat" sey "tehiyat" nuşta. Seba ke peymeyê arûzî xerepîyeno û hetê raştnuştuşî ra ganî "tehiyyat" bo ma "tehiyyat" nuşt.
  - 7 M. Zana Karakî çekuya "yumasîlhu" sey "yumazîlhu" nuşta, seba ke hetê mana ra hîna raşa ma sey Mihanîyi "yumasîlhu" nuşte.
  - 8 M. Zana Karakî çekuyê "hewe" sey "huwe" û "beyne nasî" sey "beyne'n-nasî" nuşta. Seba ke hetê raştnuştuşî ra "huwe" û "beyne'n-nasî" hîna raşa, ma zî "huwe" û "beyne'n-nasî" tercîh kerd.

- 4 Gelî qazî û miftîyê qeza me  
 Bizanin ev Se<sup>c</sup>îdê sextenam e  
 Bi nîbet me ji ewwel ve xulam e  
 Eger şahid dixwazin, Hewr û Şeqlat
- 5 Li nik Îmamê Dêrûnê û Hûrê  
 Nikare yek nefes pif ke bilûrê  
 Dixwe sondê bi Tewrat û Zebûrê  
 “Ez im îro Herîriyê Meqamat”
- 6 Belê da<sup>c</sup>wa diket ku: “şair im ez  
 Di <sup>c</sup>ilm û hem edeb da mahir im ez  
 Bi ھukmە ïsmە E<sup>c</sup>zem qadirim ez  
 Bi firek ji Cûmê herme Cûmat”
- 7 Qe ne b’xêr diket ku: “şair im ez  
 Di <sup>c</sup>ilm û hem edeb da mahir im ez  
 Bi ھukmە ïsmە E<sup>c</sup>zem qadirim ez  
 Bi firek ji Cûmê herme Cûmat”<sup>9</sup>
- 8 Qe ne b’xêr be, Se<sup>c</sup>îd ïsal li mal e  
 Büye me’mûrê exnaman ïsal e  
 Çiqas kûsî û kêrgoyêن li pal e  
 Dibê: “qaçax e, bigrin, bermedin, hat”
- 9 Bes e Xasî, bira xame xeber de  
 Se<sup>c</sup>îd bû bûk û şâşik kirye perde  
 Ji rî hona kezî, kom kir li <sup>c</sup>erd e<sup>10</sup>  
 Li ser eqda nikahê maye ew mat<sup>11</sup>
- 10 Eger bêjin: “Nikaşa wî li kê bû?”<sup>12</sup>  
 Dibêjin: “Aşiqê Fexrî begê bû”  
 Fexrî begê go: “Sûcê şâşikê bû”  
 Mi go qey Nazlıxan e j’ perde da hat

9 Na çaraneya hewtine, nuşteyê Karakî de kêmî ya. Na çarane de tena misraya verên de qismê “Qe ne b’xêr” çaraneya şesine ra ciya ya, misrayê bînî seypê yê.

10 M. Zana Karakî çekuya “ji” sey “jê” nuşta. Seba ke peymeyê arûzî xerepîyeno ma “ji” nuşt.

11 M. Zana Karakî çekuya “nîkahê” sey “nîkahe” nuşta. Goreyê nuştışê her diyan zî peymeyê arûzî xerepîyeno coka ma “nikahê” nuşte.

12 Hem Mihanî hem zî Karakî çekuya “nikaha” sey “nîkahâ” nuşta. Goreyê nuştışê her diyan zî peymeyê arûzî xerepîyeno coka ma “nikaha” nuşt.

- 11 Bese **Xasî**, Se<sup>c</sup>îd mîrê melan e  
 Welê ‘aşiq bûye l’ keçikê Filan e  
 Nikare zeft ke boncîyê qulan e  
 Welew sancûl bikî wan tu ji polat

### 1.1.2. Şîna Şêx Selîm

Na şîira kurmanckî, M. Zana Karakî tesbît kerda, nuşteyêk xo de nuşta û kovara Nûbihare de weşanîyaya. Şîire yew mersîyeya ke wefatê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (1866-1936) ra dima, ey ser o şeklê murebbaya muzdewîc de nusîyaya (Karak, 2021b, r. 82-83). Hîrê (13) çarane û yewendes (11) heceyin a. Şemaya qafîyeyê na şîire baba, ccca, ddda, ..., û qafîyeyê aye ke peynîya misrayanê çarinan yê her çarane de vîyarena zî (پ) “em” o. Ma peymeyê arûzî na şîire zî tesbit kerd, goreyê tesbîtê ma peymeyê arûzî na şîire, “Mefa<sup>c</sup>îlun mefa<sup>c</sup>îlun fe<sup>c</sup>ûlun” o.

Orijinalê nê şîiranê kurmanckîyan ke bi herfanê erebkî nusîyayê ma dest de çinî bî û nusxeyê ïnan kitabxaneyo xusûsî yê M. Zana Karakî de bî. Seba ke hem ma komputure de binusê û hem zî transkirîbeyê M. Zana Karakî dir pêveronê, ma M. Zana Karakî ra fotokopî yan zî fotografê ïnanê ke bi herfanê erebkî nusîyayo waşt, ke transkirîbe de xeletî estê çinê ma bivînê, labelê Karakî nêwaşt bierşawo. Nuşteyê Karakî ke Kovara Nûbihare de weşanîyabî, peynîya ê nuşteyan de tay rîpelê nusxeyê erebkî yê nê şîiran sey îlaweyî diyaybî. Ma va, ma nê îlaweyan ra biwanî û binusî la seba ke nuşteyê ïnan zaf qic bî nêwanîyayêne. Ma bi telefonê destan fotografê ê îlaweyan ant û gird kerdê, bi zor û zehmet ê îlaweyan ra orijinalê ïnan komputure de nuştê. La rîpelê çaraneya yewine ra heta çaraneya hewtine ê şîira şîna Şêx Selîmî, îlaweyan de zî çinî bî coka ma nêeskayê erebkîya nê hewt beytan binusê.

Na şîire de ma transkirîbeyê Karakî esas girewt, tena tay cayê ke hetê mana, raştnuştiş û peymeyê arûzî ra xeletî tede est bî ma ê cayê goreyê zanayîşê xo raşt kerdî û binenotan de nawnayê.

Mefa<sup>c</sup>îlun mefa<sup>c</sup>îlun fe<sup>c</sup>ûlun  
 . . . / . . . / . . -

- 1 Felek dîsa li min ker kir fuad e<sup>13</sup>  
 Di eşrê ewwelê şehra muherrem  
 Ji xatir derketin ke<sup>c</sup>b û wisal e  
 Wekî Leyla û Mecnûnê mukerrem

Te riħlet kir di qurba istiwayê  
 Bi bal qindîlê ‘erşê istiwayê  
 Tecerrud kir [li] kullê masiwayê  
 Wekî seyda<sup>c</sup> ú şeyx û Gewse E<sup>c</sup>zem

13 Transkirîbeyê M. Zana Karakî de çekuya “fuad” sey “fûad” nusîyaya ma raşt kerd. Eke çekuya “fuad” sey “fûad” bunisîya peymeyê arûzî xerepiyeno. Coka ma “fuad” nuşt.

Yetîm hiştin mirîd û ehl û ewlad  
 Li afaqan bela kir ah û feryad  
 Dibêñ kanî celîsê textê îrşad  
 Ku mewdûş e ji İbrahîmê Edhem<sup>14</sup>

Di piştî riħleta seyda û Şêx e  
 Hezar ateş di dilda bîne vêxe  
 Bi çakûç û kulingan her tu lêxe  
 Tune teşîr ji ber dağa muqeddem

5 Niżama mulk û millet bû ku seyda  
 Qewama dîn û dewlet bû ku seyda  
 Tebîbê cumle ɔillet bû ku seyda<sup>15</sup>  
 Li ber şermê dibûn kusra<sup>a</sup> û hâtem

Muḥîtê her dû ɔilman bû ku seyda  
 Hekîmê dağ û derdan bû ku seyda  
 Beşîrê cumle emran bû ku seyda  
 Bi wî ihya dibûn eemî û ebkem

Xetîbu'l-ewliya cedde Hefid bû  
 Emîru'l-ezkiya ceddê Hefid bû  
 Sefiru'l-eqwiya ceddê Hefid bû  
 Bi wî me'mur dibûne her dû ɔalem  
 Hezan bû hezeyan piştî Selîm e  
 Welakin Rebbê ɔalem pê ɔelîm e  
 Ew e hafîz ji bo tewra qedîm e  
 Bi isti'salekî bê keyf û bê kem

هَزِئْنُو هَذَا يَانُ پِشْتِي سَلِيمَهُ  
 وَلَكُنْ رَبَّ عَلَمٍ پِي عَلِيمَهُ  
 أَوْهَ حَافِظُرُبُو طُورَا قَيِيمَهُ  
 بِاسْتَحْسَنَأَكِيَّيِي كَنْفُو بِي كَمْ

فَأَسْسَيْقَ بَعْدَ السَّلَّ يَلْمَعْ  
 وَيُطْفَى كُلَّ نَارٍ حِينَ تَفْجَعْ  
 كَذَا مَنْ صَنَّهُ اللَّهُ فَيَنْقُعْ  
 جَمِيعُ الْأَهْلُ وَالْأَوْلَادُ فَأَعْلَمْ

Fe innes-seyfe be'ede's-selli yelme<sup>c</sup>  
 We yuṭṭî kulle nârin hîyesu tefce<sup>c</sup>  
 Keza men şanehullahu fe yenfe<sup>c</sup>  
 Cemî'e'l-ehli we'l-ewladi fe'leme<sup>16</sup>

14 Transkirîbeyê Karakî de çekuya "ku" sey "kû" nusîyaya ma raşt kerd. Eke çekuya "ku" sey "kû" bunisîya hem hetê raştnuştî ra xelet o hem zî peymeyê arûzî xerepiyeno. Coka ma "ku" nuşt.

15 Transkirîbeyê Karakî de çekuya "ɔillet" sey "ɔilet" nusîyaya ma raşt kerd. Eke çekuya "ɔillet" sey "ɔilet" bunisîya hem hetê mana ra xelet o hem zî peymeyê arûzî xerepiyeno. Coka ma "ɔillet" nuşt.

16 Metnê destxetî de îbareyê «جَمِيعُ الْأَهْلِ» sey «جَمِيعُ الْأَهْلِ» xelet nusîyayo, yanî herfa "ý" ser o cayê fethe û cezimî xelet o la Karakî transkirîbe de raştê ci nuştö.

<p>حقی و سالم و مغضوم و باقی الاھی و اوان د گل حافظ بی واقی بیدی و اوان صنختاشنیخ فراوی بکی هر یاڭ روان شهان معظام</p> <p>ایا خاصی پېھ قلب قریزه ثو بسْ او صاف سلطانان بیپیره اوی زهرا دىلدا ثو پریزه حیا ناکی ژفی تقویم آدم</p> <p>سخن خاصی ژبز ناری فراوی باھان گز کری گوی د فاقی کو باز الله اشھب پی ز عراوی لئان دا گوپرینان دین مزھم</p> <p>الله یو بحقی مصطفی کی بجاہ الیتیا وو او لیتکی دل خاصی و فتحی حوشائی بفخاڭ ناگهانی نز عرش اعظم</p>	<p>10</p>	<p>Heqiy yû Salim û Meçûm û Baqî<sup>17</sup> Îlahî wan di gel Hafîz bê waqî<sup>18</sup> Bîdî wan şuhbeta şexê fîraqî Bikî her yek ji wan şahêk muzezzem</p> <p>Eya Xaşî bi vî qelbê qirêj e Tu bes ewsafê sultanan bibêje Ewê zehra di dil da tu birêje Heya nakî ji vê teqwîmê adem</p> <p>Seher Xaşî ji ber narê firaqê Bi ahân ker kirî goyê di faqê Ku bazullahê eşheb bê j' "Iraqqâ<sup>19</sup> Liv an dağ û birînan deyne merhem</p>
--	-----------	---

### 1.1.3. Şîira Eya Hezretî Ser o

Na şîira kurmanckî zî hetê M. Zana Karakî ra vînîyaya û nuşteyêk eyo ke kovara Nûbihare de weşanîyayo de nusîyaya. Karak vano; "Melayê Xasî na şîire, Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî (w. 1924) ser o nuşta çunke beyta peyên de îfadeyê "Hezret" viyarenô û no zî leqebehê Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî yo" (Karak, 2022, r. 94-95).

Na şîira şeklê quesîde de bi pancês (15) heceyan û bi peymeyê arûzî nûsîyaya. Ma peymeyê arûzî ci tesbît kerd. Peymeyê arûzê na şîire, "Fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun" o. Şemaya qaffiyeyê ci aa, ba, ca, ..., û qaffiyeyo ke peynîya her beyte de tekrar beno zî (ا) "er" o. Şîire hewt beytî ya, beyta pancine û hewtine de tay cayî kêmî yê. Ma na şîira kurmanckî de zî transkirîbeyê Karakî esas girewt. Transkirîbeyê Karakî de cend cayan de kêmayîyê qicekî estbî ma raşt kerdî û binenotan de mojnayê.

17 Çekuya ««حقی و»» "Heqiy yû" transkirîbeyê Karakî de bê şedde sey "Heqî yû" nusîyaya ma raşt kerde.

18 Transkirîbeyê Karakî de çekuya "Îlahî" sey "Îlahî" nusîyaya ma raşt kerd. Eke çekuya "Îlahî" sey "Îlahî" bunisiya peymeyê arûzî xerepiyeno. Coka ma "Îlahî" nuşte.

19 Transkirîbeyê Karakî de çekuya "كُ" sey "kû" nusîyaya ma raşt kerd. Eke çekuya "ku" sey "kû" bunisiya hem hetê raştnuşti ra xelet o hem zî peymeyê arûzî xerepiyeno. Coka ma "ku" nuşt. Qaîdeyanê arûzî ra yew zî heceyê "û" goreyê peymeyê arûzî eşkîyeno kilm zî derg zî biwanîyo.

20 Karakî, zemîrê ««تۇ»»yî, sey "tu" transkirîbe kerdo, seba ke peymeyê arûzî xerepiyeno ma "tû" nuşt.

21 Karakî, îbareyê ««خاصی و»»xâsciî و, sey "Xaşî yû" transkirîbe kerdo, ma "Xasîy yû" nuşt.

من ژبوته صرۇڭ دىكىر و خود لو جانوجىڭ  
عاقبت تە لە بادا ئومە ور كىرىدى سقىر

تە شۇوڭىر يە دلى ناچىزە ايرۇچە دېنى  
تە بىسە ايدى ژىست تە كەنم از ژەنر

تا قىيا مت بىلەنى بېنى رنگى مە پىرس  
... تە انصافو نە رەحەمە چە دخوازى ژىڭىر

گۈدىپشىتى دىلچارى ھىيە تىشتىك تو بىي  
ورنه ايدىچە روايە توژىحدى بىكى در

رەدبه شىئەك بەمە زانىن تو بىدە  
... بىن ام بوى سرا دەدر

تە دېنى سربىرە مە تو خلاسکە ژىنى  
ور نەخواھى سىجىكى بوبە بىن مى دەدر

تە ژخاھى دلو جان بىر بە مجان بو بىر جان  
..... ژحضرت ڦىكىرىدە

Fa<sup>o</sup>ilatun fa<sup>o</sup>ilatun fa<sup>o</sup>ilatun fa<sup>o</sup>ilun  
- . - / - . - / - . - / - . -  
Min ji bo te serf dikir rûh û dil û can û ceger  
°Aqibet te li me bada û me werkir der seger

Te şevê kirye dilê naçize iro çi divê  
Ne bes e êdî ji destê te ketim ez ji huner

Ta qiyamet bihelinâ bi vî rengî me peser  
[Ne] te insaf û ne rehüm e çi dixwazî ji ceger<sup>22</sup>

Ger di piştê dil-cezari heye tiştek tu bibî  
Wer ne, êdî çi rewa ye tu ji heddê bikî der<sup>23</sup>

...r dibe şey'ek bi me zanîn tu bide  
...ni' bibin em bi wê sirra di qeder

Te divê ser bibirre me, tu xilas ke ji dinê  
Wer ne xwahî secde kî bo te bibin lê di qeder

Te ji **Xasî** dil û can bir bi mecan bû bikir can  
.....ji Hezret vekir der

#### 1.1.4. Ehmeda

Na şîire Mecmûayê Camî' yê Mela Ehmed Hilmî Qoxî<sup>24</sup> de vîyarena (Qoxî E. H., 445). Na şîira kurmançkî zî hetê M. Zana Karakî transkirîbe bîya û Kovara Nûbihare de weşanîyaya. (Karak, 2021a, r. 12) Ma zî transkirîbeyê Karakâ esas girewt. Labelê orijinalê aye ke Dîwanê Camî' yê Mela Ehmed Hilmîyê Qoxî de vîyareno ma peyda kerd û bi herfanê erebkî komputore de nuşt û transkirîbeyê Karakî dir pêvero na, cayê ke goreyê zanayışê ma xelet bî ma raşt kerdî û binenotan de nawnayê. Serê na şîire de bi herfanê erebkî "Qasîdeya Seydayê Xasî Rahîmehullah" nusîyayo. Sernameyê na şîire çinî bi, seba ke di misrayan de Ehmeda vîyareno ma sernameyê ci Ehmeda nuşt.

22 Karakî transkirîbeyê xo de, heceyo verîno ke nusxeyê erebkî de nêwanîyeno, goreyê manaya misra [Ne] nuşto labelê heceyê "تە" "te" ke nusxeyê erebkî de wanîyeno kêm nuşto. Eke "te" nênuşyo hem peymeyê hece kêm beno hem zî peymeyê arûzî xerepîyeno coka ma transkirîbe de "te" ֆlawe kerd.

23 Çekuya "حى" "heddê" de herfa "ح" "h" goreyê standardê transkirîbsiyonî ganî binê aye de nuqta biba, transkirîbeyê Karakî de sey "h" nusîyaya ma raşt kerd.

24 Kitabê Mela Ehmed Hilmî Qoxî, "Dîwana Camî" hetê Weşanxaneyê Îhsanî ra İstanbul de weşanîyayo. Kitabî de tarîxê îstînsaxkerdiş û weşanayışê çin o. Nê kitabî de Dîwana Şeyx Ebrurrehmanê Aqtepî, Dîwana Kerbelayê, Dîwana Seyyid Eliyê Findikî û gelek qesîdeyê meşayix û alimanê İslâmî estê. Kitabî de ca dîyayo yewe şîira kurmançkî yê Malayê Xasi zî.

Na şîre zî şeklê murebba de bi pancês (15) heceyan û bi peymeyê arûzî nûsîyaya. Hîrê çarane ya, qaffiyeyê aye vengê (ام) "em", şemaya qaffiyeyî bbba, ccca, ddda, ... û peymeyê arûzê aye zî goreyo ke ma tesbit kerdo, "Fa<sup>2</sup>ilatun fa<sup>2</sup>ilatun fa<sup>2</sup>ilatun fa<sup>2</sup>ilun" o.

Fa<sup>2</sup>ilatun fa<sup>2</sup>ilatun fa<sup>2</sup>ilatun fa<sup>2</sup>ilun

\_ . \_ / \_ . \_ / \_ . \_ / \_ . \_

اَحْمَدَا عَلِمْ بَشْرٌ خَاصِي ژَكْهِي اَكْهَهْ  
حُمْنُوقْضُ وَخَلْفُ وَوْقَاهَاتِي مَيْدَانْجَهْ  
جَمْلَهْ مَحْبُوسْ عَدْمُ بُنْ بِي شَبَاكْرَدْجَهْ  
نَقْطِيَا جُبِي كَشَانِي وَانْ بِادْرَأْكُوئِسْم

خَاصِيَا بَسْكَهْ اوْلُو الْأَلْبَابِ عَصْرِي مُورِكْن  
كَثَّتْ سِيمْ هَسْبِي لِسْرَنْ آثَى سُوْارِقْرَشِكْن  
مُدَّعِي اِلْبَاثْ دِكْنْ بَحْرُو گَمِي اَهْمَرْدُوكْن  
لَوْزَ اَسْرَارْ كِيشِبِيُورِيَهْ اوْنَهْ صَدَقَهْ

اَحْمَدَا دُو رِي لِهِ صُهْتِي هَنْفُوجْرَجْكُ وَدْل  
لِي بِكَهْ صَمْتُ وَسُكُوتِي نَارِتِي پِنْجَ عَقِيل  
اَي بِدِلْ كَافِرْتَيْنْ زَانِ حَقِيقَتْ بِي نَقْل  
يَغْفِرُ اللَّهُ لَنَا مَا قَدْ جَيَّنَا بِالْقَلْمِ

**Ehmeda** cilmê beşer **Xasî** ji gunhê ageh e

Hüküm û neqz û xulf û ufqa hatinê meydangeh e  
Cumle mehbûsê edem bûn bê şibak û dergeh e  
Nuqteya hubbê kişandî wan bi idrak û nesem<sup>25</sup>

**Xasiya** bes ke ûlû'l-el babê esrê morik in<sup>26</sup>

Ketne sim-hespê li ser avê suwarê qırşık in  
Mudde'a ispat dikin behr û gemî ev her dûk in  
Lew ji esrarkêşiyê borîne ew neh sed qedem

**Ehmeda** dûrî li te suhtî hinav û cerg û dil

Lê bike şemt û sukûtê naritê pencê eqil  
Ê bi dil kafir nebin zanin heqîqet bê neqil  
Yegfirullahû lena ma qed ceneyna bi'l-qeleml<sup>27</sup>

### 1.1.5. Şîra Eya Medhê Mihemed Emînê Qeynterî Ser o

Qeynter dewêka girêdayeya qezayê Hezro yê Diyarbekirî ya. Na dewe de bi nameyê Mihemed Emîn merdimêk estbîyo. Nê merdimî wextê tengayî de sêpareyêko (arayî) weş û bi camêri dayo Seydayê Xasî û ey zî na medhiye Mihemed Emînê Qeynterî ser o nuşta, pesnê ey dayo. Ayhan Yıldızı na şîre fekê Mela Muhemedê Hezanî ra neqil kerda (Yıldız, 2021, r. 92). Na şîra kurmanckî tena yew çarane ya. Seba ke na şîre, şîrêka fekkî ya û şeklê aye yê nuştekî zî ma dest de çin o, hetê peymeyê hece û arûzî ma nêşkayê biwekenê. Labelê qaso ke aseno bi qaffiye nusîyaya û qaffiyeyî ci zî "ew" o. Şîre wina ya:

Nanê germ û hingiv û rûnê teze qeymax û dew

Da me qawaltî di Qeynter ne bi xew

Dirhemâ hinte di par e firotin bê derew

Navê wî Mihemed Emîn Zadehullahu şerafen misle qewmin qed wedew

25 Karakî, çekuya "نقطیا" sey "nuqtaya" transkirîbe kerda, eke wina binusîyo peymeyê arûzî xerepîyeno. Coka ma "nuqteya" nuşte.

26 Karakî, çekuya "خاصیا" sey "Xasîya" transkirîbe kerda, eke wina binusîyo peymeyê arûzî xerepîyeno. Coka ma "Xasiya" nuşt.

27 Karakî, çekuya "بغفر الله" sey "Yegfir Allahu" transkirîbe kerda, eke wina binusîyo peymeyê arûzî xerepîyeno. Coka ma rast kerde û "Yegfirullahû" nuşt.

## 1.2. Şîrê Eyê Zazakî

Mewlidê Melayê Xasî yo kirdkî (zazakî) ke destpêkê edebîyatê zazakî hesebîyeno ra teber, ma di şîiranê eyê ke zazakî nuştî ra hayîdar bîyê la çi heyf ke heta nika, tena yewe şîira ey kewta ma dest. Na şîre zî peynîya mewlidî de derheqê nuştişê mewlidî nusîyaya û tena yewe beyt a. Şîira bîne zî şâîro namdar yê Kurdan Cegerxwîn yewe şîira xo de ci ra behs keno la çi heyf ke na şîre heta ewro nêkewta ma dest.

### 1.2.1. Ma Neqêney Hengî Behşê Emcedî

Eke yewe beyte mîyanê şîrêke de nêba, sey yewe şîira serbixo binusîya, ïnan ra "ferd" yan zî "mufred" vajîno (Adak, 2013, r. 366). Na şîira ke peynîya Mewlidê Ehmedê Xasî de vîyarena û derheqê nuştişê mewlidî de ya zî tena yew beyt a. Naye ra zî fehm beno ke na şîre dekewena besê şîiranê mufredan. Na şîre zî sey mewlidî bi yewendes heceyan û bi peymeyê arûzî yê qaliba remeli ra "Fa‘ilatun fa‘ilatu fa‘ilun"î nusîyaya (Yergin, 2024, r. 107). Qaffiyeyê şîire "ادى" "edî" yo û seba ke qaffîye de hîrê vengî seypê yê dekeweno qismê qaffiyeyanê dewlemendan.

Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun  
- - - / - - - / - -

ما ئاقنائى هنگى بحث ماجدى  
كزدى مولود محمد أحتمى

Ma neqêney hengî behşê emcedî  
Kerdî Mewlûdê Muhemmed Ehmedî

### 1.2.2. Cengnameyê Kurd û Ermén

Malmîsanij, humara hirêyine yê kovara Çira de nuşteyêk xo yo kurmanckî de neqîl keno, vano:

Şâîro namdar Cegerxwîn, yew şîira xo de behsê Cengnameyê Kurd û Ermén yê Melayê Xasî keno. Na şîira Cegerxwînî ra fehm beno ke Melayê Xasîyi, Cengnamêyê Kurd û Armenîyan zî nuşto. Weş nêzaniyeno no cengname bi kamcîn lehçe nusîyayo labelê tay kesî vanê ke bi kirdkî (zazakî) nusîyayo (Malmîsanij, 1995, r. 44). Şîira Cegerxwînî wina ya:

*Melayê Xasî mewlûda Zazî,  
Bi zarê Zazî çê kirîye, ne Tazi,  
Cengnama Kurd û Ermén nivîsî,  
Wek agir berdî me diîsî* (Cegerxwîn, 2014, r. 152).

## 2. Mulemmaya Melayê Xasî

Edebîyatê klasîkî yê rojhilatî de şîrê ke bi di yan hîna vîş ziwanan nusîyenê, ïnan ra mulemma vajîyeno. Manaya ferhengî ya mulemma, o çîyo ke rengareng o, şîrê ke bi no hawa nusîyayê de her ziwan sey yew rengî ameyo qebul kerdene û nê şîrî mecazen bîyê şîrê rengînî (Adak, 2013, r. 402). Di çeşidê mulemmayan estê. Nînan ra

yewe mulemmaya murettebe (bitertîb) a bîne zî murebbaya muşewweşe (bêttertîb) a. Goreyo ke ma pê hesyayê mulemmaya Melayê Xasî ra teber çar kesanê bînan zî bi zazakî mulemma nuştê. Nê kesî, Îbrahem Re'fetê Sêwrege (1876-1938), Mela Muhammedê Kavarî (1941- ), Mela Aziz Beki (1945- ) û Mela Faruq Baynal (1972- ) o (Ertekin & Yıldız, 2022, r. 341-353).

Mulemmaya Ehmedê Xasî, bi erebkî, fariskî, tirkî, kurdkîya kurmanckî û bi kurdkîya zazakî, bi panc ziwanan nusîyaya, yanî şîîrêka pancengîn a. Seba ke misrayêk na şîîre bi kurdkîya kurmanckî û misrayêk aye zî bi kurdkîya zazakî nusîyayê, no zî se ra çewres (%40) keno ke ma eşkenê na şîîre qismê şîîranê kurdkîyan ra bihesebnê. Yewe misra zî tirkî ya, no zî se ra vîst (%20), ke pêsero kenê se ra şestî (%60), no sebeb ra ma mulemmaya Melayê Xasî zî kerd mîyanê na xebata xo.

Na şîîre kitabê Zeynelabidîn Amedî de qismê dîyinî de vîyarena (Amedî, 1986, 10-12). Pancaneyan de misraya verêne erebkî, misraya dîyine fariskî, misraya hîrêyîne tirkî, misraya çarîne kurmanckî û misraya pancane zî bi zazakî nusîyaya. No zî nawneno ke Mulemmaya Xasî hetê bêjî ra mulemmayêka murettebe, yanî bitertîb a. Seba ke ziwanê misrayan fehm bibo ma peynîya misrayan de mîyanî parantezî de qaybê erebkî (e), qaybê fariskî (f), qaybê tirkî (t), qaybê kurmanckî (k) û qaybê zazakî zî (z) nuşt.

Verê verkan Malmisanijî mulemmaya Melayê Xasî, kitabê Zeynelabidîn Amedî ra transkirîbe kerda û kovara Çira de weşanaya (Malmisanij, 1995, 44-46). Dima qismêk na mulemma hetê Selîm Temoyî ra tadîyaya tirkî û Kovara Esmer de weşanîyaya (Temo, 2005, 48). Roşan Lezgînî, 2009 de destxetê Zeynelabidîn Amedî ra transkrîbe kerda û keyepelê zazakî net de û dima 2011 de zî Kovara Şewçila de weşanaya (Lezgîn, 2011, r. 7-9). Ahmet Kırkanî zî nuşteyêk xo de mulemmaya Ehmedê Xanî û Mulemmaya Melayê Xasî pêvero nayî û nê her di mulemmayî açarnayê zazakî û Kovara Şewçila de weşanayê (Kırkan, 2012, 56-62). Murat Varolî, meqaleya xo ya ke derheqê mulemmayanê zazakîyan de nuşta de behsê na mulemma zî kerda û transkirîbeyê Roşan Lezgînî gurenayo (Varol, 2017, r. 51-65).

Mulemmaya Melayê Xasî, heş (8) pancane û pêsero çewres (40) misrayan ra ameya meydan. Bi peymeyê pancês (15) hecayan û bi peymeyê arûzî nusîyaya. Qaliba peymeyê arûzî "Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun" û şemaya qafiyeyê aye aaaaa, bbbb, cccc, ...., û qaffiyeyê ci yo ke peynîya misraya peyêne yê her pancane de tekrar beno zî vengê (!) "er"î yo.

